

KURMANCÎ


rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîstî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan


Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Alavên candiniyê



Amadekar : ELÎŞÊR

kurdî	tirkî	fransizî	inglîzî
EREBA GA, GERDÛM A — ji aliye jor ve kopî	KAĞNI üstten görünüşü kağni karöserinin ön ve arkadaki iri ve güçlü tahtasına verilen ad.	CHAR À BOEUF vue d'en haut pièces de bois de dvant et de derrière du char	OXEN CART upper view wooden front and rear parts of a cart
1- a) kopyî paşî b) kopyî pêşî	arka tahta ön tahta	planche de derrière placne de devant	back board fore board
2- toq	tekerlek çemberi	anneau encerclant la roue	ring encircling the wheel
3- maran	tekerleğin ağaçtan gövdesi	roue en bois	wooden wheel
4- akêr (çar lib in)	karöser yük bağlama sırtları	batonnets de fixa- tion de la charge	load fixing bars
5- kursiv	tekerleğin ağaç pimi	boulon en bois de la roue	wooden wheel axle pins
6- mazlix	sürücü oturağı	siège du conducteur	driver's seat
7- çîrirk	organ veya halat sıkıcı		



kurdî	tirkî	fransizî	inglîzî
B — ji aliye binî ve 1- arêx, rexgerdûm 2- balge 3- sirnî 4- akêra sirniyê	alttan görünüşü karöser taşıyıcı dingil yastığı dingil dingil tespit çubukları	vue d'en bas cousin de l'axe axe, arbre fixateurs de l'axe	view from below axle's seating axle, axle-tree axle holding pins

Civîna payîza 1994an

Civîna payîzê di navbera
rojên 5-11 teşrîn 1994an de li
Swêdê, di xwendegeha
Biskops Arnöyê de çêbû.
Bernameya vê civînê, ji
gotûbêjên li ser hin pirsên
rastnivisînê, ferhenga
Pehlewî, devoka Qerejdaxê, ala-
vên çandiniyê, ferhengokên
Mem û Zîn, Roja Nû û termên
hiqûqê pêk hatiye.

Em hin ji encamên vê civînê
di vê hejmara Kurmancî de
diweşînin.

Hevalên ku beşdarî vê civî-
nê bûbûn ev in : Khosrow
Abdollahî (Selmas),
Mizaffer Begzade (Şikak),
Elişêr (Wan), Lutfî Baksî
(Xerzan), Rojen Barnas
(Diyarbakir), Rojan Hazim
(Hekarî), Musa Kaval
(Hekarî), Hemîd Kiliçaslan
(Mêrdîn), Mehmûd Lewendî
(Qerejdax), Kendal Nezan
(Diyarbakir), Zinar Soran
(Dêrik), Veysi Zeydanli
(Bidlîs), Zeynelabidîn Zinar
(Batman) û Reşo Zilan
(Agirî).

C — paxêl, parxêl, kışke

1- palûl

2- têli

3- kopî

4- sing

5- pêpaxêl

6- punca palûlê

öküz tarafından çekilen kızak

kızağın boyunduruk bağlantı çubukları

yük tutmaya yarayan üst yan kavisli çubuklar

kızak tespit çubukları

kızak tespit çubukları

kızak ayakları

bağlama pimi

traîneau à boeuf

fixateurs du joug du traîneau

tiges de fixation de la charge

fixateurs du traîneau

baguettes de fixation

patins du traîneau

goujon, cheville

oxen sledge

sledge yoke harness


load fixing rods

sledge cross members

sledge fixing wands

sledge skates

dowel

**D — dirgan, çarguh, yaba şene (melhêba hesinî)**

1- destî, destik

2- guhmelhêb

sap

yaba kulağî

fourche


manche

fourchon

fork

handle

tines of the fork

**E — melhêb**

1- destî

2- guhmelhêb

ağaç yaba

sap

yaba kulağî

fourche en bois


manche

fourchon

wooden fork

handle

tines of the fork

**F — mehî, malî, şapanê**

1- şivmehî

2- darmehî

3- guhmehî

4- palûl

tapan

tapan çubuğu

tapan ağacı

tapan kulakçığı

tapanı boyunduruğa bağlayan çubuklar

rouleau

tige du rouleau

traverse

montant du rouleau

tige du joug


roller

roller's rod

roller's cross-piece

roller's strut

yoke's rods

**G — kam, moşene**

1- rista kamê

2- diran, berheste yan

arbeşk (ji hesin)

döven

çekme zinciri

döven dişî

fléau


chaîne de traction

dent du fléau

flail

traction chain

flail's serrations

**H — cercere, cencere**

1- ling, rexcencer

2, 3- navpîrk

4- tevşû, devbir

harman döven

ayak

köprücük

döven bıçağı

batteuse

monture de la batteuse

traversine



lame de la batteuse

threshing machine

side strut

strut

threshing machine's blade



Pehlewî û Kurmancî

- II -

Amadekar : Rojen BARNAS

Transkrîpsiyona Pehlewî
û xwendîna wê

Kurmancîya
îroyîn

Fransizî

Îngilîzî

A

a = e

1. a) a (e) ya serî di kurmancî de nîne an jî ketiye :

abar [N: bar] (eber)	ber	sur, au-dessus	up, on, over
abaxsâyōdan, abaxsây- / [N: baxsūdan, baxsây-] (bexşūden, bexşay)	bexşîn, bexş-	pardonner, avoir pitié de	forgive, have mercy on
abē [N: bē] (ebê,/ ebî, bê / bî)	bê	sans	without, -less
abēbar [N: bēbar] (bēber)	bēber (stewr)	stérile, infécond	fruitless
abēgumān (ebēguman)	bēguman	certainement	without doubt, certain
abēgumanîh (ebēgumanîh)	bēgumanî	certitude	certainty
aswār [N: suwār] (suwar)	siwar	cavalier	horseman, rider
awērān [N: wērān]	wērān	désolé, en ruines	desolate, ruined

1. b) a (e) ya serî di kurmancî de nîne an ketiye û hin bēdeng jî cuda ne an jî guherîne :

abāg [N: (a)bā] ((e)ba)	ba, bal (cem)	avec	with
abāy- [N: bāyēd] (ebay / bayêd)	vîn / vêtin, vê- (divê, dibê)	il faut, il est nécessaire de	it is necessary, must
abēōš [N: bēhōš] (ebēoş)	bêhiş	inconscient	senseless, unconscious
abē-rah (ebêreh)	bêrê (≈)	pécheur	erring
abē-winah (ebê-winah)	bêgune(h)	innocent	innocent
asēm [N: sēm] ((e)sēm / sîm)	zîv, sîm	argent	silver
aburnāy [N: burnā] (burna)	virnî (≈)	mineur, enfant	under age, child

2. a) [h] di kurmancî de hatiye serê bêtejê an di destpêkê de ji xwe hebiye:

anār (enar)	hinar	grenade	pomegranate
and (end)	hind, hinde, hingî	autant, beaucoup	so much, many
andak (endek)	hindik	peu, quelques	little, few
asp (esp)	hesp	cheval	horse
ast(ag) / hasta (esteg / heste)	hestî	os, noyau (fruit)	bone; (fruit) stone

2. b) Awayên bi [h] û bê [h] jî di kurmancî de hene :

afrōşag (efroşeg)	evrîşk, hevrişk [≈]	confiserie à base de farine, beurre et miel	a sweet meat made of flour, butter and honey
-------------------	---------------------	--	---

3. a = e

==>

bê:

a (e)	[ê=>(bi+ê=bê, bêy)]	préfixe privatif a-	privative prefix, un-, -less
-------	---------------------	---------------------	---------------------------------

a-bahr (e-behr)	bêpar, bêbehr	privé de	portionless, deprived
a-bun (e-bun)	bêbin	sans	baseless
a-čār (e-çar)	naçar	inévitabile	inevitable
a-dād (e-dad)	bêdad	illégal, injuste	illegal, unjust
a-dard (e-derd)	bêderd	indolore	painless
a-sar (e-ser)	bêser (û bêbin)	sans fin, interminable	endless
4. a = e			
abnūs[N. ābnūs](ebnūs / abnūs)	ebanos	ébène	ebony
abr (ebr)	ewr, hewr	nuage	cloud
abrāz [N. afrāz] (ebraz / efraz)	evraz, hevraz	montée	acclivity
abrêšom (ebrêšom)	evrîšim, hevvrîšim	soie	silk
afsān[N. afsāna] (efsan / e)	efsane	histoire, fable	story, fable
almās(t) [N.almās] (elmas(t))	almast, elmas	acier, diamant	steel, diamond
amā [N.mā] (ema / ma)	em, me	nous	we, us
anîg [N.pêšānō] (enî / pêšanî)	enî	front	front, forehead
anjîr (encîr)	encîr, hejîr, hêjîr	figue	fig
awestād[N.ōstād] (ewistad / ostad)	osta, hosta, hoste, westa	maître (artisan)	master (craftsman)
æ = a			
ā (a)	a	pronom	pronoun
āb (ab)	av	eau	water
ābād (abad)	ava	populeux, florissant, prospère	populous, thriving, prosperous
ābādih (abadih)	avahî, avayî	prospérité	prosperity
āb-dān (ab-dan)	avdank	arrosoir, récipient à eau	water-holder
ābus, -tan[N.ābestan] (abus, abusten / abisten)	avis	enceinte	pregnant
āb-zan (ab-zen)	avjen (≈)	bain	bath
ādur [N. ādar] (adur / ader)	agir, ar	feu, le dieu «Feu»; 9ème mois du calan- drier, neuvième	fire; the god “Fire”; cal. 9th month; 9th day
āfrāh (afrah)	fêr kirin (hîn kirin)	enseignement, doctrine	teaching, doctrine
āgāhîh (agahîh)	agahî	savoir, connaissance	knowledge
ālag (aleg)	alî	côté	side
ālūdag (alūdeg)	lewtt, lewitî	souillé, pollué	defiled, polluted
ālūh (alūh)	eylo, elih	aigle	eagle
āsān (asan)	hêsa, hêsan, asan	calme, paisible	easy, peaceful
āškārāg[N. āškārā] (aškara(g))	aškere, aškera	évident, manifeste	obvious, evident
āškōb [N. āškō(b)] (aško)	aškî [≈]	toit, plafond	roof, ceiling
ātaxš [N. ātaš / Avesta. ātarš] (atexš / atex / aters)	ateš [e.k.]	feu	fire
āzādih (azadih)	azadî	liberté, gratitude, remerciement	freedom, gratitude, thanks
āzār (azar)	azar	tourment	torment
B			
bālîš (balîš)	balîšne, balîš, balîv	coussin, oreiller	cushion, pillow
-bān (-ban)	-van	suffixe -ien, -eur	-keeper, -guard

bandag (bendeg)	bende, benî	serviteur	servant
bār-jāmag (bar-cameg)	cemik, cemikê bar	besace	saddle-bag
bêl [M=byrl] (bêl /bwîr)	bêr	pelle	spade
bêlûr [N. bilûr] (bêlûr /bilûr)	belûr, bilûr	crystal	crystal
bistag [N. busta] (bisteg /buste)	findiq, bindeq	noisette	hazelnut
brād(brad)	bra	frère	brother
brīstan, brēz-(brīsten, brēz-)	birāştin, birêj-	rôtir	roast
brûg[N. abrû] (brûg / ebrû)	brû, brî	sourcil	(eye) brow
būdan (būden)	bûn	être	be, become
buland (bulend)	bilind	haut	high
bun (bun)	bin	base, fond, fondation	base, foundation, bottom
burdan, bar- (burden / ber-)	birin, b-	porter, meener, conduire	carry, bear, take, endure
burg (=Er: burc) (burg)	birc	tour, bourg	tower
burīdan, bur- [N.brīdan]	birrîn, birr-	couper	cut
(burīden, bur- / brīden)			
buş (buş)	bijî (ya hespê/şêr w.d)	crinière	mane
but (but)	pût, but	idole, Boudha	Buddha, idol
<hr/>			
č = ç			
čādur (çadur)	çadir	tente	sheet, veil
čahār (çehar)	çar	quatre	four
čahārdah (çehardeh)	çardeh	quatorze	fourteen
čahārpāy[N. čārwā] (çeharpay / çarwa)	çarpê	quadripiède	quadruped
čakuč [N. čakuš] (çakuç /çakuş)	çakûç	marteau	hammer
čār / čārag (çar /çareg)	çare	moyen, remède	means, remedy
čārag (çereg)	çêre, çere	pâturage, prairie	pasture, grazing, flock
čatrang => (Er. šatranj) (çetreng)	setrenc	échecs	chess
čē [N. čī] (çê /çi)	çi	quoi, que	what, which
čē (çê)	çi (ji bo çi)	à cause, comme	for, because, since, as, that
čērāy (çêray /çiray)	çire, çira (çima)	pourquoi	for what, why
čehel [N.čihil] (çehel /çihil)	čil, çel	quarante	forty
čīdan, čīn- (çīden, çīn-)	çinîn, çin-	ramasser, amasser, rassembler, empiler	gather, pile up
čīhr (çihir)	cir	forme, silhouette, apparence, visage	form, shape, appearance, face
čīhr(ag) (çihir(eg))	çirig (esil)	semence, origine; nature, essence	seed, origin; nature, essence
čim (çim)	çima [≈ / ≠]	raison, cause, but, signification	reason, cause, purpose, meaning
čimrāy (çimray)	çima?, çira?	pourquoi ?	why ?
çiray (çirey)	çira	lampe	lamp
čōb (çob)	ço, çov	bois, bâton	wood, stick
<hr/>			
D			
dādan, dah-(daden, deh-)	dan, d-	1. donner, 2. créer	1. give; 2.create.
dah (deh)	deh	dix	ten
dahigān [N. dihgān] (dehigan, dihgān)	dehqan, dehkan [e.k.]	paysan, campagnard	countryman, farmer
dahom (dehom)	dehem	dixième	tenth

dāmād (damad)	zava	jeune marié, gendre	bridegroom, son-in-law
dandān (dendan)	didan, diran	dent	tooth
darzīg [N. darzî] (derzîg / derzî)	terzî	tailleur	tailor
dastag (deste)	deste	botte, ballot,	bunch,
		bouquet, groupe	bundle, group
dast-kārîh (dest-karîh)	destkarî	travail manuel,	handiwork
dast-şoy (dest-şoy)	destşo [≠]	urinoir	urinate
dawāl (dewal)	dewl, dûl	cuir, peau	leather, skin
dawāl (dewal)	dewlok [e.k.]	supercherie, tromperie, duperie	deceit, trickery
dēnēg [N. dînî] (dênî / dînî)	dînî, dîndar	religieux	religious
didom (didom)	dido, duyem	second, deuxième	second
dō [N. du] (do / du)	du, dido	deux	two
dōstîh	(dostîh) dostî	amitié, amour	friendship, love
drahm / dir(h)am (drehm/dir(h)em)	dirhem, dirav	drachme	drachm
drayā(b) [N. daryā(b)]	derya	mer	sea
(dreyā(b) / deryā(b))			
drāz [N. dirāz] (draz / diraz)	dirêj	long	long
drō [N. darō] (dro / derox)	diro, direw, derew	mensonge, tromperie	lie, deceit
drustîh [N. durustîh]	dirustî	justesse, droiture	1) righteousness, 2) health
(drustîh / durustîh)			
dūd (dûd)	dû	fumée	smoke
dum(b)	dûv	queue	tail
duşmen [N. duşman] (duşmin/duşmen)	dijmin	ennemi	enemy
duşmenîh (duşminîh)	dijminî	inimitié	enemity
duşmenādîh (duşminādîh)	dijminatî	inimitié, hostilité	enemity, hostility
duşox (duşox)	dojeh	enfer	hell
duşwār (duşwar)	dijwar	difficile, désagréable	difficult, disagreeable
duşwārîh (duşwarîh)	dijwarî	difficulté	difficulty, trouble, misfortune
duxt (duxt)	dot-(dotmam, dotmîr)	fille	daughter
duz (d) (duz / duzd)	diz	voleur	thief
duz (d)îh (duzdîh / duzîh)	dizî	vol	theft
dwāzdah (dwazdeh)	dwazdeh	douze	twelve
E			
ê (è)	ê	particule indiquant le temps présent au mode optatif	particle giving the present tense optative sense
êbārag [N. êwār] (êbareg / êwar)	êvar	soir	evening
êç [N. hêç] (êç / hêç)	hêç, hîç	aucun	not any
êdar (êder)	ev der, vê derê	ici	here
êmêd (êmêd)	umîd, hêvî, imûd	espoir	hope
-ên [N. -în] (-ên / -în)	-în	suffixe formant des objectifs de substance ou de qualité	suffix forming adjectives of material or quality
êwāz (êwaz)	awaz	mot, parole	word, utterance
ê(w)-çand (ê(w)-çend)	ewçend	quelques (uns)	some, a few
êwên [N. ayîn] (êwên / ayîn)	ayîn	manière, coutume, forme, propriété	manner, custom, form, propriety

ēwēnag [N. āyōna] (êwêneg / ayîna)	eyne, neynik	miroire	mirror
ēw-tāg [N.yaktā] (êw-tag / yekta)	yekta, êkta	seul, individuel	alone, single, individual
ēzm [N. hēzum] (êzm / hêzum)	êzing	bûche, combustible	firewood, fuel
F			
frahang[N. farhang] (freheng/ferheng)	ferheng [≠]	éducation, savoir	education, knowledge
filāsōfā (filasofa)	filozof	philosophe	philosopher
framādār (fremadar)	fermandar	commandant, chef, dirigeant	commander, ruler, chief
framānburdār [N. farmānburdār] (fremanburdar / fermanburdar)	fermanber	obéissant, soumis	obedient, submissive
frāx [N. farāx] (frax / ferax)	fireh, fere	large, spacieux, ample, prospère	large, wide, spacious, ample, prosperous
frazānag [N. farzāna] (frezaneg / ferzane)	zana, zane	sage, intelligent	wise, intelligent
frazand [N. farzand] (frezend / ferzend)	Ferzende (nav)	enfant, fils, descendant	child, son, offspring
firēb [N. firēb](firēb / firēb)	virr	tromperie, supercherie	deceit, deception
frēstag [N. firīsta] (firēsteg / firīste)	ferīšte, firīšte	apôtre, ange	apostle, angel
frēz (frēz)	ferz	devoir, obligation	duty, obligation
frōxtan, frō(x)š- (froxten, fro(x)š-)	firotin, froş-	vendre	sell
fruşag [N.furşa] (fruşeg/furşe)	firo, fru	piqûres d'abeilles	beestings
G			
gādan, gāy- (gaden, gay-)	gan, gê-	copuler	copulate with
galōg [N.gulō] (gelog, gulo)	galok, gewrî	gorge	throat
gandagîh (gandagîh)	genî	puanteur	stench
gandum (gendum)	genim	blé	wheat
-gār (-gar)	-kar	suffixe formant des noms d'acteurs	suffix forming actor nouns
garānîh (geranîh)	giranî	pesanteur, lourdeur	heaviness, weight
gardîdan, gard- (gerdîden, gerd-)	gerîn, ger-	tourner, se tourner	turn, revolve
garmîh (germîh)	germî	chaleur	warmth, heat
garm-ābag (germ-abeg)	germav (≈)	bains, thermes	thermal baths
γarrānāg (xerranag)	xurrînî	tonnerre	thunder
gāw (gaw)	ga	boeuf, taureau	ox, bull, cow
gāw-mêş [N. gā(w)mêş] (gaw-mêş, ga(w)-mêş)	gamêş	buffle	buffalo
gazāg (gezag)	gezek	âpre, perçant, piquant	biting
gazîdan, gaz- (gezîden, gez-)	gestin, gez-	mordre, piquer	bite, sting
gêhān [N. gihān, jahān] (gêhan / gihan, cehan)	cihan	monde	world
gêhānîg (gêhanîg)	cihanî	terrestre, mortel	worldly, mortal
-gēn [N. -gîn] (-gên, -gîn)	-gîn	suffixe formant des adjectifs de qualité	suffix forming adjectives of quality
gēs [N. gēsū] (gês, gêsû)	kezî	boucles, mèches	curls, locks
gētîg [N. gētî] (gêtîg, gêtî)	gîtî	1. le monde terrestre 2. terrestre	1. the material world; 2. worldly

gilag (gileg)	gilî	plainte, lamantation	complaint, lamentation
gişnîz (gişnîz)	gişnîj, kişnîş	coriandre	coriander
gōgird (gogird)	gogird, kirkût	soufre	sulphur
gōhr [N.gawhar] (gohr,gewher)	gewher	substance, essence, nature; bijou; lignée	substance, essence, nature; jewel; lineage
gōş (goş)	guh, goş	oreille	ear
gōşag (goşeg)	goşe, koşe	coin, angle	corner
gōşwār (goşwar)	guhar	boucle et d'oreille	ear-ring
gōy (goy)	go, gog	balle	ball
gōz (goz)	gûz	noix	walnut
girāmîh (giramîh)	giramî	affection, respect	affection, respect
graw [N. giraw] (grew, girew)	girew, gerew	gage, caution	pledge, security
grih [N. grih] (grih, girîh)	girê(k)	noeud	knot
grîw (grîw)	gewrî	cou, gorge	neck, throat
grîwag [N. giriwa] (grîweg, giriwe)	gir	colline, arête, crête	hill, ridge
grîyîstan, grîy- (griyîsten, griy-)	girîn, girî-	pleurer	weep, cry
grōh [N.gurîh] (groh, guroh)	girûh [e.k]	groupe, foule	group, crowd
guftan, gî(w)- [N. go(y)-]	gotin, bêj-	dire, parler	say, speak
(guften, go(w)- / go(y))			
gûh (gûh)	gû	crottin, exéréments	dung, excrement
gund (gund)	gun, gunik	testicule	testicle
gurg (gurg)	gur, gurg	loup	wolf
gyāg [N. jāy] (gyag, cay)	cî, cih	place, endroit	place
gyānîg (gyanîg)	giyanî	spirituel, vital	spiritual; vital
H			
hād (had)	hê, ha, hêjî	encore, alors	now, then, that is
haftād (heftad)	heftê	soixante-dix	seventy
haftag [N.hafta] (hefteg/hefte)	hefte	semaine	week
haftār [N.kaftār] (heftar/keftar)	keftar, heftyar	hyène	hyena
haftdah [N.hifdah] (heftdeh / hifdeh)	hevdeh, hivdeh	dix-sept	seventeen
hamāg [N.hama](hemag/heme)	hemî, hemû	tout, tous	all
hamagîh (hemegîh)	hemûyî	totalité, universalité	totality, universality
hamāl (hemal)	heval	égal, pair, camarade	equal, peer, comrade
hambadîg (hembedîg)	hember	rival, adversaire	opponent, adversary
hambān [N.anbān] (hemban / enban)	hevan, heban, himban	sacoche en peau	skin bag
hambānd (hemband)	hevbend	connexe	connected
hambār [N.anbār] (hembar / enbar)	embar	dépot, entrepot	store
hambastan, hambah-	kambax kirin	s'écrouler, tomber	collapse, fall
(hembesten, hembeh-)			
hambāy (hembay)	hempa	compagnon, part-	companion, part-
		naire, adversaire	ner; adversary
ham-kār (hem-kar)	hevkar	collaborateur	collaborator
ham-pursag (hem-purseg)	(ji) hev pirsîn	consultation	consulting
hamtāg [N.hamtā] (hemtag/hemta)	hemta, hevta	égal, pair	equal, peer
handām [N.andām] (hendam/endam)	endam	membre	member
handaxtan, handāz-	endaz, endaze	projeter, attribuer,	plan, allot,
(hendexten, hendaz-)		considérer, juger	reckon, judge
hangām (hengam)	hingê, hînga	moment, occasion	time, occasion

hanjām [N.anjām] (hencam / encam)	encam	fin, achèvement, issue	end, completion, outcome
harg [Er. xarj, xarāj] (herg / xerc, xerac)	xerc, xerac	devoir, tribut, travail, effort	duty, tribute, work, effort
haşāgird [N.şāgird] (heşagird / şagird)	şagird, şagirt	disciple, élève	disciple, pupil
haştad (heştêd)	heştê	quatre-vingt	eighty
haştadah (heştdeh)	hejdeh, hijdeh	dix -huit	eighteen
hāwan (hawen)	hawin, hawan	mortier	a mortar
haxt (hext)	hêt	cuisse, hanche	thigh, haunch, hip
hazār (hezar)	hezar, hizar	mille	thousand
hiştan, hil-(hiştên, hil)	hiştin, hêl-	laisser, pardonner	let, leave, pardon, set, appoint
hixr (hixr)	rêx, rîx	excrément	excrement
Hrîm [N.Rûm](hrom/rûm)	Horom, Rom	Byzance, Rome	Byzantium, Rome
huşk [N.xuşk] (huşk / xuşk)	hişk	sec	dry
I			
im-(im-)	î- {îroj / îşev / îsal}	ce, ceci	this
imrōz (imroz)	ev-{evro/evşev/evsal}		
	îroj, îro	aujourd'hui	today
J = C			
Jahūd [N.juhūd](cehûd / cuhûd)	cihû, cuhî	juif	Jew
jaşn (ceşn)	cejn	célébration, festival	celebration, festival
jaw (cew)	ceh	orge	barley
jawēn [N.jawîn](cewên / cewîn)	cehîn	d'orge	made of barley
juxt [N.juft] (cuxt / cuft)	cot, cuxt	paire, couple	pair, couple
K			
ka [N. kî] (ke / kî)	ku, ko	si, puisque, lorsque	when, if, since
kabārag (kebareg)	kewar	conteneur, récipient	container
kabk (kebk)	kew	perdrix	partridge
kabōd (kebod)	kevok	gris-bleu; pigeon	grey-blue; pigeon
kadbānüg [N. kadbānû]	kebanî, kevanî,	maîtresse	mistress, lady
(kedbanûg / kedbanû)	kabanî	de maison	of the house
kadîg (kedîg)	kedî, kehî	domestique, serviteur	domestic; servant
kafç (kefç)	kepçe	louche, écumoire	ladle, skimmer
kafçag (kefçeg)	kefçî, kevcî	cuillère	spoon
kafşgar (kefşger)	koşkar, goşkar	cordonnier	shoemaker
kaftan (keften)	ketin, keftin	tomber	fall
kāh (kah)	ka	paille	chaff, straw
kamān (keman)	kevan	arc	bow
kamar (kemer)	kember, kemer	taille, ceinture	waist, belt, girdle
kard (kerd)	kir	action, sujet, affaire	action, matter, affair
kārd (kard)	kêr	couteau	knife
kārdāg (kardag)	gerrek, gerrok	voyageur, vagabond, nomade	traveller, wan- derer, migrant

kardan (kerden)	kirin, kirdin	faire, agir, exécuter, accomplir	do, make, act, perform
karg (kerge)	kergedan	rhinocéros	rhinoceros
kāskēnēn (kaskēnēn)	keskîn, keskîni	bleu-vert; en lapis-lazuli	blue-green; of lapis lazuli
kayk (keyk)	kêç	suce	flea
kēnwar [N.kînarwar] (kênwer/kînewer)	kîndar	vengeur, vindicatif	vengeful, vindictive
kēsar (kēser)	qeyser	César	Caesar
kēs (kēs)	(xîret)kēs, (cir)kēs	dogme, foi (en particulier pour les non Mazdéens)	dogma, faith (especially non-Mazdean)
kēşîdan, keş-[N.kaşîdan] (kêşîden, kêş- /keşîden)	kişandin, kiş-, kêşandin	tirer, traîner, arracher	pull, draw
kirm (kirm)	kurm, kurmik, kirm	ver, serpent	worm, serpent
kōdak (kodek)	kodek, gede, kudik	jeune, petit; bébé	young, small; baby
kōfîg [N.kōhî](kofîg/kohî)	kovî, kûvî	sauvage, montagne	wild, mountain
kōftan, kōb- (koften, kob)	kutan, kut-, qutan	battre, piler, écraser	beat, pound, crush
kulaçag [N.kulîça] (kuleçeg /kulîçe)	kulîçe, kulînce (çorek)	petit pain rond	small, round bun
kulang (kuleng)	kuling	grue	crane
kûn (kûn)	qûn	croupe, fesses, derrière, anus	rump, buttocks, anus
kunjîd (kuncîd)	kuncî	sésame	sesame
kurrag (kurreg)	kurîk, kurî	poulain	foal, colt
kuştan, kuş-(kuştan, kuş)	kuştin, kuj-	tuer	kill

L

lab (leb)	lêv	lèvre	lip
lābag [N.lābal](labeg /labe)	lava , lavayî	supplication	supplication
lābakkar (labekker)	lavakar	suppliant	suppliant

ŞANEK :

[≈]	maneya gotinê ya kurmancî bi ya îngîlîzî re têkildar e, lê ne wek hev e.
[≠]	maneya gotinê ya kurmancî an bi ya îngîlîzî re dijmane ye an jî lê nanihêre.
[f]	maneya gotinê ya kurmancî an bi ya pahlewî re dijmane ye an jî lê nanihêre
[e.k.]	di edebiyata klasîk de.
=====	
a (e) => ê	mard / mêr, nar / nêr
b => v	āb / av
b => w	abr / ewr
d => z	dāmād / zava
f => v	frêb / virr
g => c	gāh, / cih, cî
s => z	sîm / zîv
m => v	sîm / zîv
ş => j	duşmen / dijmin, duşox / dogeh, duşwar / dijwar
h li pêşiya dengdaran =>	āsān / hêsa, asp / hesp, anjōr / hêjîr, andak / hindik, anār / hinar
k => q	pākōzag / paqij, pondik / findiq, bindeq, pistag/ fistic
w => b	warān / beran, warāz / beraz

Çend pirsên rastnivîsê

Reşo ZÎLAN

Pirsa rastnivîsîna zimanekî, bê guman, pirseke gelekî girîng e û ji bo çareserkirina wê jî demek divê. Hindek ji wan pirsgrêkan jî destpêka nivîsandina zimanekî de û hindek jî piştê û di nav herikîna zemên û pêşdeçûna zimên de hatine pêş. Îro gelek zimanên standardîzebûyî jî her di vê pirsê de xwedî pirsgrêk in û ji bo çareserîya wan timî gavina diavêjin.

Zimanê me, ku serpêhatiya wî dîrokeke dûr û dirêj pêk tîne û xwedî taybetmendiyên xweser e, ji van pirsgrêkên aloz ne şûstî ye. Pirs rastnivîsîna wî jî hewceyî çareserkirinekê ye. Ji ber vê yekê jî, ev pirs yek ji xalên girîng yên civîna li ser zimanê kurdî ya zaravayê kurmançî pêk tîne.

Di van civînan de, lêhûmêrîn û gotûbêjên lidarkefî hêdî hêdî digihêjin encam û pêwistiya zelalkirinekê. Di vê benda han de, em ew çend xalên ku gihîştine encam û dongiyekê berpêşî xwandevanan dikin.

I. Pirs rastnivîsîna pirtikên tewangê

A) Di navên taybetî de

Herweku tete zanîn, navdêr di zimanê me de tete tewandin. Li gor qesd û mebesta hevokê, hin pirtik bi navdêran ve tete nûsandin da ku wê meramê binim zimên. Bo nimûne, gava em dibêjin, «ez Gulbînê dibînim», pirtika tewanga me ku li vir «ê» ye, bi navdêr ve tete zeliqandin ku ew jî li vir «Gulbîn» e. Navê mirovekê ye.

Di van salên dawîn de, ji ber nezanîn û nexwandewariya zimanê xwe, hin kes di dema nivîsandinê de wê pirtika tewangê bi alikariya apostrofeke jî navdêr vediqetînin. Ango wek «Gulbînê» dinivîsin, ku jî kok şaş e û tiştêkî ne li rê ye.

Heçî nişandeka apostrofe ye, li gor zimanan, xwedî hin kar û wezîfeyan e. Bo nimûne, ew kar û wezîfeyên wek jêveqetandinê, ketina tîpekê yan çend tîpan, forma genîvê û hwd tîne çîh.

Di zimanê me de, ew di nivîsînê de bêtir jî bo ketina tîpekê yan jî çend tîpan, kurtkirin û pevnûsandina daçekên hevedudanî ku bi karên têvel radibin, tete bi kar anîn. Ev yek jî bêtir di tiştên zargotinî, stran û helbestan de, da ku kêşa stran û helbestê nehête têkdan, tete pêş.

Wek di strana Remzo de :

*Rêka Midyatê teng e
Paçê Remzo heftreng e
Ramîsanek bide min
Êvar e l'min dereng e.*

Heke «l'min» ya li vir, wek «li min» bihata nivîsîn û stranbêj ew welê bi lêv bikira dê kêşa wê ne sazkar bûya. Hejmara kiteyan nema dibû 7, lê dibû 8. Ji ber vê yekê, da ku kêş sazkar û bilêvkirin û awaza wê bi aheng û harmonîk be, stranbêj mecbûr dimîne, ku «li min» ya ji du kiteyan pêk hatî, bike yek kîte û wê bi lez wek «l'min» bi lêv bike. Ev yeka han ne bi tenê di stranên me yên klasîk û zargotinî de tete pêş, lê belê di helbestên me yên klasîk û nûjen de jî.

Di rewşa îro de, di pirs rastnivîsîna pirtikên navdêrên jîmaran de, tevlihevî û aloziyeke yekcar mezin heye.

B) Di navdêrên jîmaran de

Di zimanê me de, ne bi tenê navên tişt û miştan navdêr in û xwedî zayend in. Lê belê, navên jîmaran (reçem) jî navdêr in û her yek ji wan jî xwedî zayendekê ne. Ji lewre jî, dema ku ew dikevîne hevokêkê, divê ew li gor qesd û mebesta hevokê bêne tewandin. Bê tewandin, ew nikarin kam û merama hevokê bi serrastî berpêş bikin.

Di warê zayendên jîmaran de tiştê hewceyî gotinê ev e, ku jîmara «1» (yek)ê, mê lê yên din hemû jî nêr in. Tewandina wan jî divê li gor çîh û halê wan yê di hevokê de be da ku di gel mebesta hevokê rêk bikeve.

Heçî jîmara «1» (yek)ê ye, ew di hin devokên kurmançî de, bi taybetî jî di dema bikaranîna rojên mehan de, dibe nêr. Bo nimûne; ji dêl ve «yeka meha hezîranê», dibêjin «yekê meha hezîranê».

Wek hate gotin, di dema nivîsandina jîmaran de, pêwîst e, ku ew li gor çîh û halê di hevokê de bêne tewandin. Heke em di rewşeke weha de jîmaran ne bi reçemkî, lê bi tîpkî binivîsin, çu tiştêkî ku mirov li ser bixave, tune ye. Ji ber ku ew jîmar di gel pirtikên tewanga xwe tîne nivîsîn û ji hev nahêne veqetandin. Wek: «Zarok hê nikarin heta sedî bihejmêrin».

Di vê hevokê de, ji ber ku navdêra «sed» nêr e, divê tewanga wê di vî halî de «î» be. Vêca di nivîsînê de em nikarin vê «î» ya han jî navdêrê veqetînin û wê jê cuda binivîsin. Ji lewre jî ew divê wek «sedî» li qelemê keve. Lê belê, pirs ew e, ku gava ev navdêr ne bi tîpkî, lê bi jîmarkî (reçemkî) bêne nivîsîn, divê çilo li qelemê keve. Di nivîsarên kurmançî de, heta niha çend nimûne hatine pêş.

Ya yekê : Bê pevzeliqandina pirtika tewangê, bi tenê wek «100» nivîsîn e. Bê guman, ev jî aliyê rêzimana kurmançî ve, ne rast û serrast e. Ji ber ku di

zaravayê kurmançî de navdêr hemû xwedî zayend in û pêdiviya tewandina wan tiştêkî mecbûrî ye. Ji lewre jî, bi vî awayî nivîsîn, pêpeskirina bingeheke girîng ya rêzimanî ye.

Ya didwan : Bi apostrofe veqetandina pirtika tewangê û wek «100î» nivîsîn e. Herweki di xala jorin e jî hate çel kirin, apostrof bi karekî din radibe û ev pirtika han ya «î»yê jî, bi navdêr ve ye û jê nahête veqetandin.

Ya sisyan : Piştî navberekê her yekser li pey jîmarê, bê çu nişandekê pê ve be, wek «100î» nivîsandina wê ye. Di awayê vê rastnivîsînê de jî, ku nivîsarên rehmetî mir Bedirxanan jî her bi vî rengî ne, çewtiya hevi dîsan vedigere ser pirsê jî navdêrê veqetandina pirtikên tewangê ye û ji lewre jî rexne dixwe.

Ya çaran : Bi nişandeka tîre (-)yê ew wek «100î» nivîsîn e, ku bêtir jî aliyê Kurdên kevnesovyetistanê ve tete bi kar anîn. Herwisan min bi xwe jî bervederîya wê yekê dikir, ku ew bi vî celebî bête nivîsîn.

Piştî gotûbêj û lêhûrbûneke kûr û dûr, baweriya ku ji bo me peyda bû, ev nişandeka han ya tîreyê, ku ew bi xwe jî bi gelek karên têvel radibe, ne hewceyî nivîsînê ye. Madem ku ya herî girîng ew e, ku divê em navdêrê li gor çîh û halê wê yê di hevokê de bitewînin û sedî sed pirtika tewangê binivîsin, vêca çêtir e, ku ew her yekser di gel jîmaran bête nivîsîn. Bê ku çu nişandekê yan jî navberekê bête bi kar anîn. Ango wê wek «100î» binivîsin. Bi riya rakirina tîre û nişandekê din, hem di lezahiya nivîsînê de rihetiyek peyda dibe û hem jî em ji sergêjyên din xelas dibin.

Bi vî rengî em çêtir dibînin, ku ji vir û ha de, herwek di van çend nimûneyên jêrin de jî xuya dibin, pirs rastnivîsîna pirtikên tewangên jîmaran weha binivîsin:

Keça me hê 4ê xwe danegirtiye.

Em ê di 22yê meha tebaxê de li Serdestê bin.

Dayîka Keviyê ne di rêza 3yan, lê di yan 5an de rûniştibû.

Salvegera 49emîn ya komara Mehabadê nêzik e.

Wî ne dereceya 1emîn lê ya 3hemîn bin.

Zorgîn û Sévê di sala 1985an de hatibûn serdana me.

